Nordkurdiska

Vilket imorgon kommer jag att välja?
– om uppväxt och föräldraskap mellan kulturer

Ez dê kîjan pêşerojê hilbijêrim?
– li ser mezinbûyînê û dêûbavîtîyê di kulturên cuda de

Folkbildningsförbundet –
Studieförbundens intresseorganisation,
Stockholm 2004.

Ez dê kîjan pêşerojê hilbijêrim?
– li ser mezinbûyînê û dêûbavîtîyê di kulturên cuda de

Ji welateke din hatin û li swêdê dêûbav bûyîn tê çi maneyê? Ev nivîsar li ser vê pirsê ye.

Weke dêûbav, mirov bi rêya ”cudabûyînê” û wergirtina hêjahîyên û dîtinên ku ji mirovî re xerib in, dikare ji wendakirina zarokên xwe bi tirs be. Zarokê te li Swêdê mezin dibe? Tu divê çawa bikî ku zarokên te kultura xwe ya eslî (bingehîn) bikaribin biparêzin? Çiqas Swêdîbûyînê li cem zarokên xwe tu dikarî qebûl bikî? Gelo zarok dikarin xwe girêdayî gelek kulturan bibînin, yan jî divê ew hilbijartinek bikin?

Hemû dêûbav carinan xwe di dudilîyê de hîs dikin. Dê rewşa zarokên min çawa be? Dê ba ş be ku mirov li ser pirsên wisa bi dêûbavên din re bipeyîve.

Do, îroj, sibê
Russl Almosawi

Do
Li ber sîya xanîyê
Dayîka min pore min şeh kir
Û du gulîyan çêkir.
Îroj,
Rêya veqetandinê ye
Di navbera do û sibê de
Ez dê
sibeyek (pêşerojek) çawa
hilbijêrim?

1. Li welateke din mezin bûyîn

Dema ku dêûbav nizanibin ku li Swêdê hin tişt çawa pêk tên û, zarokek ji dêûbavê xwe re bibêje dê ew çawa hereket bikin, mirov dikare gelek aciz bibe. Mîna dêûbav, mirov dikare hêrs bibe û şer derkeve.
Piranîya xortan dixwazin nîşan bidin ku ew serbixwe ne. Ev yek ne hewceye bê maneya ku ew dê bibin ”Swêdî”. Her weha, nayê wê maneyê jî ku ew dixwazin ji dêûbavên xwe û ji kulturên xwe dûr bikevin. Eger mirov zorê nede xortan û ew bi xwe bikaribin hilbijêrin, ew dê bikaribin herdu kulturan bigihînin hev (bikin yek).

- Di xortanîya xwe de ji bo kirina tiştekî ji alîyê dêûbavê xwe ve zor li te hat kirin yan na?
- Rewşa te çawa bû?
- Te bi xwe hilbijartiba dê çi lê hatiba?

Zarok li vir û nuha dijîn û dixwazin bibin herdu jî
Dêûbav malbat ji bo tiştên ku zarok hîn dibin, xwedîyê maneya herî mezin in. Lê her weha, hevalên li zarokxaneyê û li dibistanê û kesên li der û dor yên civatê bi tevahî jî girîng in.

Zarok dive her tiştê ku dibîne û dibihîse, fahm bike. Eger awayê fikirandinê yên li malbatê û civatê ji hev cuda bibin, zarok dixwazin herduyan jî fahm bikin. Tiştên ku li dibistanê

diqewimin yên ji male çêdibin cudatir in. Li dibistanê mirov herdem wekî ku li male difikire, nake. Lê zarok nikarin bi tenê awayeke fikirandinê hilbijêrin. Ew di herdu rastîyan de dijîn.

Piraniya wan dixwazin bikaribin li ser herdu kulturan jî xwedîyê fikir bibin û bikaribin bibin ”hem ev û hem jî ya din”. Mirov dikare van zarokan, mîna zarokên ”bihevûdu girêdanê” bi nav bike. Ev tê maneya ku ew Fînîyên-Swêdê, Kurdên-Swêdê, Yunanîyên-Swêdê yan jî Soma-lîyên-Swêdê û hwd. bibin. Ew dive diyayên xwe bi xeta hevgirêdanê ve bi hev girêbidin. Ew dikarin bi herdu tiştan ve jî (kulturan) dagirtî bibin.

- Dema zaroktîyê te de li derûdora te kulturên ji hev cuda hebûn?
- Dêûbavê te vê yekê çawa didîtin (dinirxandin)?
- Maneya vê rastîyê ji bo te çi bû?
- Di navbera du yan jî zêdetir kulturande mezinbûyînê de tu çi tiştên neçê (negatîf) dibînî?
- Çêyîya (kara) vê yekê çi ye?
- Ew wêneya ”xeta hevgirêdanê” (bindestreck) fikrên çawa bi te re peyda dike?
- Tu xwe çiqas ji ”hem ev hem jî ya din” (herdu kultur) hîs dikî?
- Zarokê te çiqasî ”hem ev hem jî ya din” e?

> ”Ez xwe wekî Swêdîyek nabînim. Lê ne wekî Turk jî nabînim. Ez xwe weka Ayşe dibînim (hîs dikim). Ez tehamulî cudakirina navbera ”ew” û ”em” nakim. Ez, bi tevî hevalên xwe yê ji hemû cureyan, Ayşe ya ji Stockholmê me.”
> *Multikultiungdom*

Kultura Xortanîyê (Ciwanîyê)
Mirov bi girêdana xwe ya etnîkî û grûba sosyal ya di nav nifşa xwe de xwedîyê aîdîyetek kulturî ye. Xortên ji grûbên etnîkî yên cuda dikarin ji bi xort û salmezinên ji grûba etnîkî ya xwe zêdetir xwedîyê nirx û hêjahîyên muşterek bin. Stîlên cuda yên di warên cil, şiklê mirov û muzîk di nav grûbê de nirx û hêjahîyên muşterek peyda dikin.

Xortek kul i derveyî welatê dêûbavê xwe de dijî girêdayî bi kêmanê sê kulturên cuda ye ku ew jî ev in:
– Kultura dêûbavê
– Kultura piranîyê ya swêdî ya li civatê
– Kultura xortanîyê

- Tu dizanibûyî ku di dema xortanîya xwe de tu jî girêdayî kultureke xortanîyê bûyî?
- Tiştên ku we, xortan ji yên salmezinan cuda dikirin çi bûn?

Guherandinên di navbera nifşan de
Ciwan dixwazin guherandinan çêbikin û yên salmezin jî bi piranî dixwazin yên Kevin biparêzin. Ev, tiştek pir ecêb (xerîb) nîne. Mirov, tiştên ku nas dike û dizane dixwaze biparêze. Tiştên ku nû nin û û nenas in dudilä å böewleyä peyda dikin. Loma jî gelek caran di navbera nifşên cuda de nakokî peyda dibin.

Gelek tiştên ku em di zaroktîyê xwe de hîn dibin ew tişt in ku em bi xwe wekî yên xwe hîs dikin û dizanin, bêyî tu kes ji me re behs bikin û bidin zanîn. Tiştê ku di bingeha kulturek e em wisa bi rehetî naxwazin biguhurin.

- Nifşa te û nifşa dêûbavê te li ser kîjan pirsan li hev nedikirin?
- Gelo tu dizanî ku di navbera dêûbavê te nifşa dêûbavê wan de nakokî hebûn yan na?

- Di dîtina te ya li ser jîyanê de tiştê herî girîng ku tu dixwazi neqlê zarokên xwe bikî, ‘i ye?
- Li gora bawerîya teç tiştê ku li Swêdê jê herî zêde tê hezkirin, çi ye?
- Li gor bawerîya te, zarokên te yên biçûk yan cî yên ciwan li ser eynî tiştê çi difikirin?

Kultur tên guhertin
Mirovên ku bi kulturek taybetî dijîn, her tim gav bi gav wê kulturê diguhirin. Evy ek her tim wisa bûye. Kultur, adet, hêjahî û tradîsyonên (adetên) dînî bi rêya ku hin beşên wan tên avêtin û hin beşên din jî xurtttir dibin û ji nûve tên nirxandin û şirovekirin, têntên pêşvexistin.

Em hemû jî, bêyî ku em bi rastî jî pê bizanibin (weke masîyên di avê de), di nav kulturên xwe bi xwe de nin û di eynî demê de jî di hewildana ji nû ve şikildayîna wê de nin. Kultur, bi tenê dema mirov wê bi kulturek din re muqayese bike dibe tişteke zelal û vekirî.

Her weha, di nav eynî kulturê de jî grubên cuda yên bi adet û şiklên ji hev cuda henin. Û her ye ji mej î di nav kultura xwe de xwedîyê rolên cuda yên kulturî nin, bo nimûne li malbata xwe, li cîhê kar yan jî di dema hevdîtina bi kesên nenas re.

- Di dema jîyana nifşa te de di kultura te de çi guhertin çêbûne?

2. Dêûbavîtî ya ciwanan

Hemû dêûbav dixwazin bi zarokên xwe re serbilind bibin xwe wekî dêûbav biserketî hîs bikin. Heta ku zarok biçûk in, ev tişt dikare hêsan be, lê gelek caran zarok dema mezin bibin û ber bi ciwanîyê bên û êdî dest bi protestoyan bikin, ev tişt zehmettir dibe.

Ciwan, ji bona ku hîs bikin gelo ew di rewşek ”rast” de nin yan na, dixwazin ji xwe bipirsin ”gelo ez kî me?” û rolên û hidûdên cuda tecrube bikin. Bêguman, dema zarokên ciwan pê li hidûdên girîng bikin, dive yên salmezin helwest deynîn û reaksîyon nîşan bidin, lê bi dîqqet bin.Yan na, mirov dikare wan bi tiştên ku mirov dewil dide daku wan jê xelas bike ve, hişktir girêbide.

Dêûbav jib o zarokên xwe dikevin nav taswasê (nerehetîyê) lê di eslê xwe de jib o taswasê hertim sedem li hole tune nin. Dêûbavên bi taswas in, her dice zêdetir pirsa dipirsin. Wê demê, dê zarokên ciwan xwe wek kesên pênebawer û kontrolkirî hîs bikin û dest pê bikin ku her bersîvên kurt û bêdil bidin. Tabîî ye (xwezayî ye) ku zarokên ciwandemek bixwazin ku xwe ji dêûbavê xwe hinek dûr bixin, lê dû re ew paş ve tên.

- Li ser zarokên xwe yan jî ciwanên xwe çi taswasên te hene?
- Ji bo taswasên te tu sedemên berbiçav û rastî hene?
- Zarokên te yan jî ciwanên te li ser taswasên te çi difikirin, bawerîya te çi ye?
- Bawerîya te ya li ser, gelo dêûbavên swêdî li ser ciwanên xwe ji bo çi taswasê dikin, ‘i ye?

”Divê hûn destpêbikin û bi me bawer bibin! Em ji kurdbûyîna xwe serbilin in, lê em xwedîyê mafê azadiya xwe nin. Hûn dive li ser vê yekê piştgirîya me bikin û nebin dayîkên zordar (despot)!”
Gotinên keçên kurd yên ciwan di minaqeşeyek bi dayîkên xwe re ku ji alîyê Yekîtîya Jinên Kurdîstanê ve hatibû amadekirinê de.
Kurdiska tonårsflickor i en diskussion med sina mammor. Diskussionen ordnades av Kurdistans kvinnoförbund.

Îro li Swêdê dêûbav bûyîn

Belkî jî îroj di dema me de êdî dêûbav bûyîn zehmettir bûye. Zarok û ciwan êdî dikarin ji medya zêdetir tiştan hîn bibin. Ew îtîrazê zêdetir tiştan dikin. Ew êdî bi tenê qaîde û qedexeyan naxwazin, dixwazin sedeman jî bizanibin û pirsa ”çima” dipirsin.

Dema ku zarokên te dest pê bikin û bi te re sedemên tiştan minaqeşe bikin, mumkun e ku tu difikirî ku rewş ne xweş û bêhurmet bûye. Ev yek ji bo dêûbavên swêdî jî dikare wisa be. Em dive hîn bibin ku ji awayê ku dêûbavê me bi me re dipeyîvî cudatir bi zarok û ciwanên xwe re bipeyîbin û peywendî deynin. Awayê swêdîyan yê mezinkirina zarokan jî di navbera nifşên cuda de hatîye guherandin.

- Tiştekî ku ”di awayê swêdîyan ya zarok mezikirinê de” tu jê hez nakî heye yan na?
- Di şûna wî de tu dixwazî îi bikî? Çima?
- Gelo, li ser dêûbavek swêdî dê awayê xwe yê fikirandinê û hereketkirinê dê çawa îzah bikira, dîtin û bawerîya te çi ye?

Mafên Zarokan
Peymana Neteweyên Yekbûyî (NY) ya zarokan dibêje ku;
– Zarok dive *li hember hemû awayên cudaxwazîyê (dîskrîmînasyonê) bên parastin*. (Xala 2-yan).
– Di hemû biryaran de dive *berjewendîya zarokan* li ber çav bên girtin. (Xala 3-yan).
– Dêûbav dive *zarokan terbiye bikin û rêberîya wan bikin*. (Xala 5-an).
– Zarok xwedîyê *mafên jîyanê û pêşketinê nin*. (Xala 6-an).
– Zarok dive xwedîyê *mafê îfadekirina dîtinê xwe be* û dive jê re hurmet bê nîşandayîn. (Xala 12-yan).
– Zarok dive *di jîyana xwe ya malbatî û şexsî de, li mala xwe yan jî di peywendîyên xwe yên bi rêya nameyan de*, bi desttêwerdanên (midaxeleyên) kêyfî yan jî neqanşnî re rûberû neyên hiştin. (Xala 16-yan).

Li gora qanûnên swêdî, zarok xwedîyê maf in ku li wan baş bê nêrîn, ewleyîyê de bibin û terbîyeyek baş bigrin. Terbiyeyek baş girtin tê maneya ku;

- Zarok hîn bibe ku ji xwe re hidûdan deyne û berpirsîyarî bigre.
- Zarok hîs bike ku ew bi qimet tê dîtin.
- Zarok bikaribe, dema wexta wî bê êdî girêdayî dêûbavê xwe nebe.

Mafê zarok heye ku hurmeta şexsîyeta wî/wê bê girtin.
Mafê zarok e ku bi mezinbûyênê xwe re her ku biçe hîn xurttir hurmeta jîyana şexsî ya wî/wê bê girtin.
Divê zarok bi cezayên fizîkî (lêxistin) yan jî awayên din yên biçûkxistinê ve neyê rûbebû hiştin.

- Ew xalên cuda yên Paymana Zarokan di jîyana rojane de tên çi maneyê?
- Tu bi xwe di dema zaroktîya xwe de xwedîyê kîjan ji van mafan bûyî?

3. Li Welateke din dêûbav bûyîn

> ”Yek ji wan seferên herî dirêj ewê ku em di hundirê xwe bi xwe de dikin û ew jî hertim bi hînbûyîne tişetek nû, tiştek din, tiştek xerîb dest pê dike.”
> *Theodor Kallifatides*

Pêvajoya Penaberîyê
Dema mirov welatê xwe terk dike, gelek guherandinên mezin dest pê dikin û êdî mirov ne eynî ew kesê berê ye. Biryara terka welat berpirsiyarîyeke gelek giran e. Terka welat tê maneya xatirxwestinên gelek zehmet, taswasî û tirs. Revîn yan jî seferkirin dikare bi gelek awayan dramatîk be. Wek penaberek mirov dikare gelek trajedîya jîya be û rastî gelek rewşên bixeter û tehdîtkar bûbe. Di dema pêşî ya li Swêdê mirov dikare xwe di bê ewleyîda hîs bike, bêrîya paşvegerê bike û li ser pêşeroja xwe bitaswas bibe.

Dema ku mirov li welatek nû bi cîh dibe divê mirov ji destpêkê dest pê bike û zimanek nû hîn bibe, belkî mecbûr bimîne ku dest bi meslekek nû bike yan jî betal bimîne.

Her ku wext derbas bibe mirov di wê jîyana nû de dikare jîyana xwe bimeşînê û berê xwe bide pêşerojê. Ev rewş tê maneya ku mirov ji pêvajoya penaberîyê êdî derbas bûye. Dirêjahîya vê pêvajoê, dikare li gora êexsan ji hev cudatir bibe.

Merheleyên Pêvajoya Penaberîyê
- Jê qûtbûyîn: bêçaretî û hêza helwestdanînê
- Revîn yan jî seferkirin: taswas û bêewleyî
- Dema pêşî ya li welatê nû: xwe guhertin, xwe lê guncandin û bêrîya welat
- Piştî wextek derbas bibe: bi xwe re li hev hatin, hedefên nû tesbît kirin, û entegrasyon

- Sedema ku te anî vê derê çi bû?
- Dema te ya pêşî li Swêdê çawa bû?
- Tu li kîjan merheleya pêvajoya penaberîde yî?
- Zarokên te di kîjan merheleya pêvajoya penaberîyê de nin?

Em û Ewan
Tiştek tabîî ye ku mirov di destpêkê de xwe, ji gelek tiştên ku li welatê nû hene, dûr dixe. Di eynî demê de mirov welatê xwe derdixe ser esmanê. Lê, divê mirov di rewşek wisa de xwe asê neke.

Dema ku em rastî tiştên nû û xerîb tên, em li tiştên xwe bi xwe bi çaveke din dinêrin. Loma jî gelek caran ”yên din” ji bo me weke tiştên ”ecêb” û nenas xuya dibin. Em mirovan mina EM û EWAN ji hev diqetînin. Ev tişt hîsa mirov ya hevbeşî û aîdîyetê xurttir dike.

Eger em cesater bikink u hewl bidin ji bo hevûdu nasînê, em dikarin di navbera xwe de piran ava bikin. Em dikarin wê demê hevbeşîyên xwe bibînin û yên mej i hev cuda dikin, dikarin heyecan peyde bikin.

- Tiştê di kultura Swêdê de ku herî zêde bala te kişandîye, çi ye?
- Li gora bawerîya te, tiştê di kultura te de ku Swêdî gelek caran jê ecêbmayî dibin çi ye?
- Li gora bawerîya te, sedema vê yekê çi ye?
- Divê mirov li ser ew resimên ku serê mirov de li her hevûdû çêdibe çi bikeç da ku bikaribe bi hevûdu re bijî?

Bêrîkirin û êş
Kesê ku terka welatê xwe dikê, êş û bêrîkirinê hîs dike. Bêrîya vegerê kirin, dikare bi gotina nostaljî jî bê binavkirin. Ev hîseke germ e ku bi bibîranîna mirovan, cîhan, bêhnan, melodîyan û hwd re dagirtî ye. Gotina nostaljî gotineke ji yunanî ye ku ji nostos (paşvegerîn) û algos (êş) hatîye avakirin.

Carîna mirov dikare di nostaljîya xwe de bisekine bêyî ku bikaribe pêş ve biçe. Mirovên ku xwe di bîranînên li ser tiştên derbasbûyî de asê dikin, gelek caran zehmetîyan dikşînin ku ji tiştên nuha diqewimin razîbûyîn û dilxweşîyê hîs bikin. Eger dêûbav di nostaljîyên xwe de asê bibin û nikaribin pêşerojê bibînin, mumkun e ku ew dê bi tevahî dê nikaribin zarokên xwe û pêwîstîyên zarokên xwe bibînin.

- Tu ji welatê xwe herî zêde bêrîya çi dikî?
- Ew tiştê ku jê re asêbûyîna nostaljîkî tê gotin dizanî çi ye?
- Li gor bawerîya te, li hember vê yekê mirov dikare çi bike?
- Mirov dikare çawa awayek (rêyek) bibîne ku *hem* bikarbe bêrî bike û *hem* jî pêşîya xwe bibîne û gavên nû bavêje?

”Min, bi armanca ku, di sîhûşeş salên min yên di bîyanîbûyînê de çi bi sere min hatîye muhasebeyek bikim, dest bi nivîsandina vê nivîsê kir. Ez nebûme swêdî, her çend ez êdî ne ew yunanî yê min bawer dikir ku ez im. Ez ne bi sedî sed bîyanî me jî. Bi kurtî ez nikarim bibêjim ku ez bûme çi. /.../
Hin dem henin ku ez xwe ji dema ku ej ji dayîka xwe bûm tazîtir hîs dikim, ew dema ku mirov bi kêmanî bi navika xwe ve girêdayî ye û ez wekî ku mirov piştî evîndarîyek nebiserketî de ye, xemgîn dibim.
Lê hin dem henin ku ez rehetî û dilxweşîyeke kûr hîs dikim ji bona ku min ji ew tiştê ku ji ber xwe de hebû cudatir tiştek nas kir û jê hes kir.”
Theodor Kallifatides i boken ”Ett nytt land utanför mitt fönster”.

Ne bi eynî lezî bi hev re çûyîn
Mumkun e ku hemû endamên malbatek di pêvajoya penaberîyê de bi eynî awa û lezî derbas nebin. Zarok jî ji ber ew kesên, cîhên û tiştên ku li welatê xwe li paş hiêtine, xemgîn dibin. Lê ew di dema nuha de dijîn û jib o tiştên kun û nin bi mereq in.

Eger dêûbav nikaribin rastîya zarokên xwe bibînin dikare rewşek ku zarok û dêûbav di peywendîyên xwe de zehmetîyan bikêşînin.

- Biryara terkkirina welat ji alîyê kî ve hat stendin?
- Zarokên te çawa ji vê yekê hesîyan?
- Li gora bawerîya te zarokên te li ser welatê we çi difikirin?
- Tu bawer dikî ku zarokên te his dikink u destûra te heye da ku ew bikaribin ji zarokxaneyên, dibistanên yan jî hevalên xwe yên swêdî hez bikin?
- Li gora bawerîya te penaberî çawa tesîrê li ser zarokên te kirîye?

Nefreta ku asteng e
Zarokek nikare, di hawirdorek ku dive jê hez neke de, pêşbikeve û xwe baş hîs bike. Zarokên ku li swêdê mezin dibin, divê bi destûr bin ku tiştên swêdî jî hez bikin. Eger dêûbav ji tiştên swêdî nefretê bikin û derûdor jî xwe ji kultura bingehîn yên van zarokan dûr bixin, dê zehmetî çêbibin. Wê demê mumkun e ku zarok bi xwe dest pê bike û ji hin beş û alîyên xwe nefret bike.

- Ji bona fikirandinên li ser gotinên nefretê û ji xwe nefterkirinê çi difikirî?

• Tu bi xwe ji derûdor a xwe nefretê li hemer te hîs kirîye?

Xewnên li ser pêşeroja zarokan
Zarokên ku diçin zarokxaneyên swêdî yan jî dibistanan û bi zarokên swêdî re dilîzinç bi xwe re fikrên nû tînên mala xwe. Dêûbav jib o wendakirina zarokên xwe dikarin bitirsin ku dê ew bibin kesên ”cuda” yên bi hêjahîyên xerîb.

Mecbûrmayîna terka welatê xwe kirin hertim zehmet e. Lê ev tiş dive bi hêvîya ku dê zarok bikaribin bibin xwedîyê pêşerojeke baştir ve bê berhevdayîn (muq1ayesekirin). Dema ku mirov bitirse ku dê zarok bibin ”swêdî” wê demê xewnên mirov têk diçin.

Carina zarok bi xwe berpirsîyarî digrin ji bona ku ew bi xwe wisa bijîn da ku tiştên dêûbavên wan wenda kirine bên pêkanîn. Ev yek bareke bê mentiqî ye jib o ku zarok bikaribin hilgirin.

> ”Dema ku bavê min behsa dike ku ew di feqîrîyek çawa de jîya ye ez digirîm. Ez xemgîn dibim, lê gelo ez dikarim çi bikim?Nuha dive ez hertim xwe spasdar hîs bikim ku jîyana min baş e. Lê ew jîyan jîyanek din bû.”
> *Nina i Multikultiungdom.*

- Tu qet ketîyî nav taswasên ku dê zarokên te bibin swêdî?
- Tu bawer dikî ku zarokên te, ew hêvî û dxwazên te jib o xwe wekî barek hîs dikin?

4. Malbat, heskirin û cinsîyet

Malbat çi ye?
”Malbat” dikare bê maneyên ji hev gelek cuda, bo nimûne hemû xizim û mirov yan jî bi tenê dê û bav û zarok. Malbat, mina hemû cîhên li cîhanê li Swêdê jî gelek girîng e, lê bi awayeke din. Jin û mêr wekhev in. Her yek ji wan xwedîyê berpirsiyarîyê xwe nin. Zarokên ciwan dikarin carinan xwe ji malbatê xwe dûr bixin ji bo ku serbixwebûyîna xwe nîşan bidin.

Di malbatê de kî xwedî desthilat e, berpirsîyarî û wezîfeyên nav malbatê çi nin, di demeke kurt de li Swêdê hatine guherandin. Berê, yekîtî û hevgirtina malbatê û mirovan girîngtir bû. Îroj, zarokên li Swêdê di malbatên ku şeklê wan ji hev gelek cuda nin de, mezin dibin. Piranîya wan bê dê û bavên xwe re mezin dibin.Lê gelek zarok xwedîyê dêûbavên ji hev veqetîyayî, zir dêûbav (dêmarî, jinbav, zirbav), xwişk û birayên ne ji dêûbavên xwe nin.

- Maneya malbatê ji bo te çi ye?
- Li gora bawerîya te maneya malbatê ji bo swêdîyên ku tu nas dikî çi ye?
- Rewşa jîyana malbatan li welatê te di van demên dawîyê de hatine guherandin yan na?

Di malbatan de rolên nû
Li Swêdê, kesên ku xwedîyê xwedndin û kar bin, zûtir dikevin nav civatê. Carina, ji bo jinan dikare rehettir be ku rêyên nû peyda bikin. Zarok gelek zû li ser tiştên swêdî dibe xwedîyê zanînê. Kesên salmezin carina ji bo peywendîyên bi civata Swêdê re mecbûr dimînin ku alîkarî ji zarokên xwe bigrin. Di rewşên weha de êdî bav ne ew kes e ku bi nave malbatê ter tiştî dizane, dikare. Wê demê di malbatê de rolên û û her weha belkî jî nakokîyên nû peyda dibin.

> ”Mîna zarokên penaberan gunehê mirov ji dêûbavên mirov re tê. Ew, dev ji her tiştên xwe berdane û hatine welatek nû ku li wê derê hertim hewcedarê alîkarîyê ne ji ber ku ziman nizanin. Zarok û ciwan zûtir ziman hîn dibin û di hemû peywendîyên bi civata

Swêdê re det pê dikin û alîkarîya dêûbavên xwe dikin. Bi vî awayî, ew li ser jîyana salmezinan dibin xwedîyê zanîn û agahdarîyeke firehtir ku mîna zarok mirov ne pêwîst e ku bizanibe."
Nalin Pekgul

Her çiqas ku di gelek malbatan de çêbibin jî, gelek zehmet e ku mirov li ser bipeyîve. Mirov naxwaze nîşanê kesên din bide ku mirov di nav zehmetîyan de ye.

- Tu ji peywendîyên malbata xwe de, xwe di vê taswîrê de dibînî yan na?
- Eger wisa be, hûn karîbûn ku li ser vê yekê bipeyîvin?
- Malbatên din yên ku rewşa wan mîna vîya ye hene yan na?
- Hûn dikarin li ser vê pirsê bi kesên din re bipeyîvin?

Jin li Swêdê
Ji bona wekhevîya di navbera jin û mêran de li Swêdê, rêyeke dirêj maye. Lê, di demeke kurt de guherandinên mezin çêbûne. Demeke zêde ji ser wê demê ku mêr li ser jinan biryar didan, derbas nebûye. Jin, ji alîyê aborîyê ve girêdayî mêran bûn. Ew divê pîrek, dayîk û navmalî (jina male) bûya. Îroj herkes lihevkirî ye ku dive wekhevî hebe. Jin û mêr di jîyana civakî de xwedîyê maf û îmkanên wekhev bibin. Jin û mêr dibê hem bikaribin dêûbavîtî bikin û hem jî bikaribin bixebitin.

- Rewşa jinên li Swêdê ji ya welatê te ya îroj bi çi awayî cuda ye?
- Tiştên baş û nebaş yên di van rewşan de çi nin?

Dîtina li ser mêranîyê
Tiştên ku mirov bi "jinbûyînê" yan jî "mêranîyê" ve girê dide, li gora demên cuda û civatên cuda tên guhertin. Li jêr hin bersîvê ji hin jin û mêran li ser vê pirsê hatine nivîsandin:
"Li malbatê xwe xwedî derneketin ne mêranî ye."
"Tirsonekek nikare hîsn xwe nîêan bide."
"Bi rêya bi kar anîna şidetê çareserkirina nakokîyan, li gora dîtina min nîşaneke jib o ne mêranîyê ye."
Ez bawer dikim ku ji kar destûr girtin û li malê bi zarokê/a xwe ya nûçêbûyî re mayîn mêranî ye."

- Ji bo te "mêranî" tê çi maneyê?
- Bawer dikî ku dîtina te ya li ser vê pirsê ya ji dêûbavê te guhertî ye?
- Li gora bawerîya te, ji bo çi mêrên Swêdî ji alîyê hin ji bîyanîyan ve mina "nemêranî" dikin tên nirxandin?
- Berevajî ya vê, li gora bawerîya te jib o çi mêrên bîyanî ji alîyê mêrên Swêdî ve carina mina kesên "maço" tên nirxandin?

Dîroka malbatan ya li Swêdê
Li Swêdê, *jinek nezewicî*, cara pêşî di sala 1858-an de, bi şertê ku bi xwe daxwaz bikira, mîna kesek reşît hate qebûlkirin. Ji sala 1863-yan şûn veç jinên nezewicî ji 25 salîya xwe şûn ve bi otomatîkî bûn kesên reşît. Ev hidûd di sala 1884-an de hat daxistin ji bo 21 salî.

Ji 1864-an şûn ve mafê mêr tunebûye ku li jina xwe bixe.

Ji 1874-an şûn ve jin bûn xwedîyê mafê ku ew bi xwe li ser hatin û mulkê xwe (hebûnên xwe) biryar bidin.

Ji 1915-yan şûn ve jin bûn xwedîyê mafê ku daxwaza ji mörö xwe veqetandinö bikin.

Cara pêşî, *jinên zewicî* di sala 192-an de di 21 salîya xwe de êdî wekî kesên reşît hatin qebûlkirin. Di eynî wextê de ew bi mêran re bûn xwedîyê mafên aborî û hiqûqî yên wekhev.

Di 1921-an de jin bûn xwedîyê mafê raydayînê û hilbijartinê di hilbijartinên sîyasî de.

Cara pêşî, di sala 1965-an de tecawuz a di nav zewacê de pêkhatî hate qedexekirin.

- Tu şiroveya te ji bo van tarîxên dîyarkirî re heye yan na?
- Li welatê te, jin kîngê bûn xwedîyê mafê raydayînê?
- Hin muqayeseyên din yên balkêş henin ku tu bi xwe dîyar bikî?

Dîtina li ser evîndarî û zewacê
Zewac dive li ser bingeha evîndarîyê ava bibe yan jî evîndarî bi xwe di dema zewicîbûyînê de ava dibe? Kî li ser zewacê biryar dide? Mirov divê dema îend salî be bizewice? Zewac çawa çêdibe? Ev tişt di demên cuda de û di kulturên cuda de ji hev cuda pêk hatine. Li Swêdê bi xwe jî adet gelek hatine guherandin. Nuha, normal e ku ciwan/xort berîya ku bizewicin bi hevûdu re dijîn. Gelek kes bêyî ku bizewicn bi hevûdu re dijîn.

- Di dîtinên li ser evîndarîyê û zewacê de, li welatê te çi guherandin çêbûne?
- Li ser vê pirsê di dîtinên di nav mirov û xizimên te de cudabûn hene yan na?

Dîtina li ser cinsîyetê
Dîtina li ser cinsîyetê jî li gora demên cuda û kulturên cuda hatine guhertin. Piranîya civatan xwestine kul i ser cinsîyeta jina kontrolek deynîn da ku bizanibin bavê zarokan kî ye. Li Swêdê, di demên berê de peywendîyên cinsî yên li derveyî zewacê, bi cezayên giran dihatin cezakirin.

> ”Ji bo jinên pîr, problem ne bi tenê kêmbûyîna agahdarî û aletên prezervasyonê (pêşîlêgirtinê) bûn, lê her wisa herlwestên wan li hember cinsîyeta wan bi xwe jî problem bû. Ew bêrîkirina mêrek, ku bi tevahî tişteke tabîî ye, divê ew nîşan nedana, wê demê ew mîna ku jê re tê gotin, jinên nexweêî mêran dihatin binavkirin. Jin bi xwe divê ji bo peywendîya cinsî înîsîyatîf wernegirta, ew divî evîna xwe nîşan dedabûya, jinên wisa re bi tenê dihat gotin ku ew jin `jinên wisa nin`.”
> *Hemêşîreyeke li civata kevin ya gundîtîyê li Gotlandê li ser pirsên jîyanê dipeyîve.*

Tu dîtineke ”swêdî” ya giştî li ser cinsîyetê tune ye, lê îroj piran hebûna cinsîyetê di peywendîyeke evîndarî ya berîya zewacê de qebûl dikin.

Di destpêka salên 1900-î de Swêd welatek feqîr bû û malbat xwedîyê gelek zarokan bûn. Ji her deh zarokek yek, berîya ku yek salîya xwe tije bikin, dimirin. Gelek jin ji ber sedemên zarokjibergirtinên (abortên) îllegal dimirin. Bi aletên pêşîlêgirtina bihenilbûyînê û zarokjibergirtina azad, nuha zarok dikarin bi xwestek bên dinê. Nîsbeta zarokjibergirtinê li Swêdê kêm e û nîsbeta mirina zarokan herî kêm a dinyayê ye.
Perwerdeya li ser cinsîyetê û bihevûdu re jîyanê kul i dibistanan tên amadekirin, giranî dide ser rêzdarîyê, wekhevîyê û hêjahîya wekhev ya herkesî. Yên ciwan, li ser fonksîyona laşê mirov, peywendîya cinsî, dolgirtinê, bihemilmayînê, aletên pêşîlêgirtinê û nexweşîyên cinsî, perwerde dibin. Ew, her wisa li ser pirsa ku mirov divê li cinsîyetê û peywendîyên nav cinsên cuda, exlaq û pîvanan çawa binêre jî, dipeyîvin.

Li navendên lênêrîna ciwanan de (ungdomsmottagning), yên ciwan dikarin li ser pirsên xwe yên ciwanîyê, mezinbûyînê û avakirina çexsîyeta xwe şîret û pêşnîyaran werbigrin. Ew dikarin her weha li ser laş û cinsîyet pirsan bipirsin û li ser aletên pêşîlêgirtinê şîretan werbigrin.

Perwerdeya li dibistanan li ser bihevûdu re jîyanê û peywendîyên li navendên lênêrîna ciwanan, wan teşwîq nake ku peywendîyên cinsî çêbikin. Li van deran, dîtin û zanînên girîn yên li hember ew dîtin û resimên ku li medyayê bi awayek sivik û sethî li ser cinsîyetê û bihevûdu re jîyanê tê dayîn.

- Li ser tiştên ku zarokên te li dibistanê li ser cinsîyetê û bihevûdu re jîyanê hîn dibin, tu çi dizanî?
- Tu bi xwe, li ser laş, çêkirina zarok û pirsên mîna wan, çawa hîn bûyî?

Namûs û şeref
Ji bo jinên li Swêdê, gotina namûs her tim hatîye maneya cinsîyeta jinan û peywendîya wan bi mêran re. Lê, jib o mêran, gotinên namûs û êeref bi cinsîyeta jinan ve nehatîye girêdan. Ev gotin, zêdetir hatine maneyên ku mirov mêrxas be û bikaribe xwe biparêze.

Gelek dêûbavên ji welatên din dikevin taswasa ku dê keçên wan dest pê bikin û mîna ”swêdîyan” bijîn û berîya zewacê tecrubeyên peywendîyên cinsî pêk bînin. Gelek caran mirov wisa bawer dikin ku keçên swêdîyan gelek azad in, ku di rastîyê de new isa ye.

Eger ji bona keçikan qaîdeyên gelek hişk û teng bên danîn, ev yek dikare rê lê veke ku ew jîyaneke ”dualî” bijîn, li malê bi awayek bibin û bi hevalên xwe re bi awayeke din.

Di malbatên ku nêzîkî mirov û xizmên xwe re dijîn de gotina namûsê hîn girîngtir e. Di van rewşan de derketina nave mirov bi awayeke xerab cîheke mezin digre, lê di bajaran de ev tişt kêm in.

Di rewşên herî xirab de, taswasên dêûbavan ji bona namûsa keçan û ya malbatê rê li bikaranîna tade, tehdît û şiddetê veke. Piranîya van kesan li dijî lêdan û helwestên heqaretkirin û biçûkxistinê ne. Lê, şiddeta mêran li hember jinan di civata Swêdê de jî pêk tê. Gelek girîng e ku mirov bikaribe bi rêya munaqeşeya sedeman li hember bikaranîna tehdît û şiddetê bisekine û rêyên pêşîlêgirtina wan peyda bike.

- Ji bo te, maneya gotina namûsê çi ye?
- Ferqa ku kontrol di destê civatê de be yan jî di destê malbatê de be çi ye?
- Li gora bawerîya te, çi dikare pêşî lê bigre ku nakokîyên nav endamên malbatek nebe sedema bikaranîna şiddetê?

Ne bi tenê keçik in
Rewşa xortan û mêrên ciwan jî dikare zehmet be. Carina dive ew, her çend ne bi dilê wan be jî, li ser xuşkên xwe nobedarîyê bikin. Her weha ji van xortan tê daxwaz û hêvî kirin ku ew ji nav gruba xwe bi kesek re bizewicin.

> ”Dêûbavê Elî, hêvî dikin ku ew bi keçek kurd re bizewice, lê ev çend sal in ku ew bi keçikek swêdî re ye. Nuha ew di jîyana xwe de bi hilbijartineke rêya xwe ve rûbirû ye: lid û adetên dêûbavê xwe here yan jî zêdetir mina swêdîyek bijî. Fikrên wî sere wî dihêre û ev zext dikare wisa bike ku ew bêyî ku xwe bilivîne rojek sax li ser texta xwe vezelandî û bê hereket bimîne. Hi rojên din jî ew kêfxweş e ku, xwednina wî ji hemû van fikirandinan dûr dixe.
> Gotina Elî ew e ku, jîyana di navbera du kulturan de ji bo xortan jî bi qasî keçikan dikare zehmet bibe. Li dû adetên dêûbavê xwe neçûn xwedîyê buhayek e, her çend ev buha ji bona keçikan dikare girantir bine.”

- Li gora bawerîya te, keçên ciwan yên ku di nav du kulturan de dijîn rastî tadeyek piralî yê çawa dibin?
- Li gora bawerîya te, xortên ciwan yên ku di nav du kulturan de dijîn rastî tadeyek piralî yê çawa dibin?

Rêyeke nû vekirin

Guherandina kulturan, adetan, pîvanan û hêjahîyan çawa pêk tên? Kî hidûdan datîne û kî biryar dide da ku di nav gruba xwe ya etnîkî de yan jî di nav malbata xwe de mirov bi away-ek taybetî hereket dike?

- Di dema mezinbûyîna te deç guherandina tiştek di nav malbata te de mumkun bû yan na?
- Îroj, di nav gruba te ya ku ji alîyê kulturî ve tu girêdayî ye, kî ”destûr/îzin” dide ku şirovekirina hin tiştan ji nû ve dikare bê qebûlkirin?